Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1293 | 27-Tîrmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Landayî Helbest û Stranên Jinên Peştonî

**Navenda Nûçeyan**

Çima me xwest van helbestên landayî wergerînin zimanê kurdî û lêkolinan li ser bikin?


Sedema pêşî, jinên ev helbest nivîsîne nexwende ne; li ser jiyana xwe û hinek dozên civakî nivîsîne. Sedema duyan, landayî di kelepora gelêrî ya cîhanî de cureyeke helbestan a taybet e. Sedema sêyan, di navbera van helbestan û helbestên jinên Kurdan de hevbeşiyek heye; ango dê civaka kurdî were ber çavên Kurdan dema van helbestan bixwîne. Bi taybetî rewşa jina Kurd di civaka êlî ya kurdî de nîşan didin.

Navê van helbestan bi zimanê Urduyî Landayî ye. Ev peyv bi kurdî tê wateya kurt, ango kurtehelbest. Feylosof û nivîskarê Efxanî Dr. Seyîd Beho Dîn Mecrûh (1928-1988) dibêje: « Jinê peştonî ev helbest di nav xwe de diaferandin, distiran û bazdidan. Ew du xêzên serbixwe ne li ser mijarekê ne. »

**Landayî Dengê Kê ye?**

Landayî dengê hundirîn yê jina peştonî ye. Herwiha ji bo em civaka efxanî ji bingeh ve nas bikin, giyanê gelê vê civakê vekolin, divê em helbestên landayî bi baldarî bixwînin û li wan mijûl bibin. Carinan nêrînên siyasî û rewşenbîrî cewhera gelan diyar nakin. Di Rojhilata Navîn de pir caran siyasetmedar û rewşenbîr di bin bandora hêvî û daxwazên xwe de hin nêrînan dinivîsin. Lewra hinekî dûrî helkeftê dikevin.

Di van helbestan de, em nêrîna jina







Efxanî ya gelêrî li ser jiyan, civak, welat, penaberî û hinek mijarên din dixwînin. Bi taybetî li ser civaka nêrzayî ya êlî û ya misilmaniya tûndrewî Ev jin ne siyasetmedar in, ne rewşenbîr in; tiştekî ji dîroka civaka xwe nizanin. Ew bi sewdan û hestan zarokên dema xwe û civaka xwe ne; û dûvre endîşe û fantaziyên siyasî ne. Em karin bibêjin, ev helbest zimanê civaka helkewtî ne. Bi gotineke din, ev helbest seranser rewşa jinê ya nûdemî di vê civakê de û taybetiya serkêşiya wê didine xuyakirin.

**Çend Landayî:**

Xwedayê min
nehêle jinek li penaberîyê bimire
gava cankêşiya xwe ya dawîn bikişîne
dê navê te ji bîr bike
ji ber ku wê çaxê xeynî warê xwe
li tiştekî din narame.

***
Birayên min
desmalên xwe wekî piştanan girêbidin
tifingan rakin û herin meydana çewşenê.
***
Li ser zemîna welatê min
çêjeya xwîna şehîdan wekî gulîlkên nîsanê ne
ji bihara azadiyê re.
Jê hez dikim jê hez dikim
venaşêrim mendel nakim
heta ku bi kêran şanikên min
yek bi yek hilkişînin.
***
Ger tu bi evîna min dîn nebî
tu şîla Lo mirovên bê dilovan
***
hun dibînin kalek min kaşî nivînê dike
û hûn dipirsin çima ez digirîm
çima pore xwe dirûçikînim.va lêvên min çêje nakî
***
Şev e dilyarê min
pencere tarî ye
û nivîn pir in
lê xişexişa bazinên min
dê nivîna min nîşanî te bike.
***
Ewilî min di nav zendê xwe ke
bila tu yê min bî
paşê tu dikarî
xwe li hêtên min ên qedîfeyî bipêçî.
***
Lawiko, were de tu were
bila serê min qurbana serê te be
şevek ji şevên van payîzan
mêvanê sîng û berê dosta xwe be

**Salih Bozan**

Di sala 1951'an da li Gundê Şewitî yê ku bi bajarokê Girê Sipî ve girêdaye ji dayik buye. Li Yekîtiya Sovyetê, li Uneversîta Kiyêvê di sala 1978'an da mastera ekonomîyê wergirtiye. Di Mûzeya Bajarê Helebê de rêveberiya beşa hunerê kiriye. Niha li Almaniyayê penaber e.

Berhemên wî yên çapkirî:
1. Lawo - Kurteçîrok. Dihok 2003
2. Wergera dîwana Ebdilwehhab Beyatî "Helbestên Evînê li ser Dergehên Heftane yên Cihanê". İstanbol 2004
3. Isra û Mihrac- Werger û lêkolîn. Hewlêr 2014
4- Maristan- Şano. 2019.
5- Gigamiş û Enkîdo - Lêkolîn. Rojava-Qamişlo 2022
Landayî Helbest û Stranên Jinên Peştonî
Werger : Salih Bozan

## Gotina Dawî



### Colanî şertên Israîlê qebûl kirin!

Mihemed Seydi

Êrişên li ser Siwêdayê li başûrê Sûriyê rojeveke germ a herêmê ye. Ji ber ev rewşa pêkanîna komkujiyan ji aliyê desthilata veguhêz a li Şamê ve, rûyê wan yê tûndrew û Daiş'iyan derdixe holê. Her çiqasî reng û rû guherî bin, lê cewher nehatiye guhertin. Dîmen û belgeyên ku belav bûn, hovîtiya DAIŞ'ê di destpêka avakirin û belavbûna wê de hat ber çavên me. Mirov ji ser xaniyan hatin avêtin, hatin serjêkirin û bi komî hatin gulebarankirin. Hêzên desthilata li Şamê destpêkê piyên xwe hilmalan û ji wê be, çawa here, ew ê xelkê Siwêdayê yên Durzî çekên xwe radestî wan Daiş'yan bikin û bibêjin werin bikevin bajarê me. Lê hesabên wan li nav hev ketin, dema rastî helwesta Xelkê Siwêdayê hatin ku ew rêveberiya xwe radestî tu alî nakin.

Herwiha vê carê desthilata Colanî di bin navê Eşîrên Ereb de çekdarên xwe kom kirin û êriş birin ser Durziyan, lê dîsa jî bi bin ketin. Nema dizanîbûn çawa xwe ji vê binkeftinê rizgarbikin, lê nûnerê Amerika yê Sûriyê wekî parêzvan ket dewrê û xwest bibêje, ne hêzên hikumeta Şamê ne ku ev komkujî pêk anîne û dibe DAIŞ'ê kincên wan li xwe kiribin û ev kuştin pêk anî bin. Li aliyekî berxwedana Xelkê Siwêdayê li hember van barbar û Daiş'yan û li aliyê din helwesta Bakur û Rojhilatê Sûriyê û ragihandina Kurdan tevî çalakvanên Kurd li ser tevnên civakî, parastina nirxên gelê Sûriyê kirin û hiştin desthilata Colanî ya li Şamê teşhîr bibin û hêzên navdewletî jî di vê mijarê de destwerdan bikin.

Encama vê tevgera ku çêbû, ew bû ku wezîrê karê derve yê desthilata Colanî li Parîsê bi Israîlê re peymanekê îmze bike ku hin ji xalên wê ji aliyê Çavkaniya Mafên Mirovan a Sûriyê ve hatin belav kirin. Di nava xalên li ser hatiye lihevkirin jî ew e ku divê hemû komên ku êrişî Siwêdayê dikin çi yên li ser navê desthilatê û çi jî yên din, ji herêmê vekişin û başûrê Sûriyê bibe herêmeke bêçek.

Di rastiyê de ya ku çê bû ne li hevkirin bû, lê Nûnerê Amerîka yê Sûriyê Tomas Barak nûnerên desthilata Şamê li dû xwe circirandin Parîsê û ew mejbûrî îmzekirina vê peymanê kirin. Ew jî wekî hewleke xilaskirina Colanî ji têkçûnê bû. Her çiqasî desthilata Şamê xwest vê peymanê veşartî bihêle, lê nekarî û hemwextî wê li Siwêdayê jî Rêveberiya Xweser hat ragihandin û eşkerekirin ku ew ê tu alî li vê herêmê ji bilî xelkê wê nebe desthilat.

Dixwazim bibêjim ku li Sûriyê yên bi gef û tehdîdan bixwazin serweriya xwe li ser herêman ferz bikin, ew ê têk biçin. Bi barbarbûnê û tirsê jî desthilat wê nikaribin li ser piyan bimînin. Sûriya wê venegere serdema Baas û yên dixwazin heman modêlê ji xwe re ava bikin û ji wan be ew ê bi desteka navdewletî heta dawiyê li ser piyan bimînin, bila ji xwe re Beşar El-Esed û rêjîma Baas binêrin.

### Sudoku:Pirs 50

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | | 3 | |
| 9 | | | | | 8 | 6 | 2 | |
| 5 | | | 3 | 2 | | 4 | | 7 |
| | 8 | 7 | | 1 | | 9 | | |
| | | | 7 | | 2 | | | |
| | | | | 4 | | 7 | 5 | |
| 4 | | 8 | | 5 | 7 | | | 6 |
| | 3 | 6 | 9 | | | | | 5 |
| | 2 | | | | | | | |

### Sudoku: Bersiv 49

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 8 | 1 | 2 | 9 | 5 | 6 | 3 | 4 |
| 2 | 9 | 3 | 1 | 4 | 6 | 5 | 7 | 8 |
| 4 | 6 | 5 | 3 | 7 | 8 | 9 | 2 | 1 |
| 5 | 1 | 9 | 8 | 2 | 7 | 3 | 4 | 6 |
| 6 | 2 | 4 | 5 | 1 | 3 | 7 | 8 | 9 |
| 8 | 3 | 7 | 4 | 6 | 9 | 1 | 5 | 2 |
| 3 | 5 | 2 | 6 | 8 | 1 | 4 | 9 | 7 |
| 9 | 4 | 6 | 7 | 5 | 2 | 8 | 1 | 3 |
| 1 | 7 | 8 | 9 | 3 | 4 | 2 | 6 | 5 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Li vî guhê dikeve, di guhê din re derdikeve:**
- Guhê xwe nadiyê; pêk nayne.

**Pirsa bi xesûyê ye:**
- Dipirse lê dîsa weke xwe dike; ne bi dilê xwe dipirse; ji bo ku adet cihê xwe bigire dipirse.

**Pişta xwe da me çû:**
- Bê ku me agahdar bike lê da çû.

**Ser de çû/bi ser de çû:**
- Ji bo karekî pê bide kirin pir li ber da.

**Serî jê standiye:**
- Êdî guhê xwe nadiyê.

**Serê min şehkirî ye, derziya min jî di ber de ye:**
- Keyfa min li cî ye; ez xema tiştekî naxwim; kî çi dibêje bila bêje ez guhê xwe nadim wan; ne li xema min e.

**Serê werîs di destê wî de ye, ka çawa dixwaze wisa dipîve:**
- Guhê xwe nade ti kesî; weke xwe dike; bandora ti kesî li ser nîne.

**Tembûra ber ga ye:**
- Çiqas şîret lê bên kirin jî beredayî ye; guhê xwe nade ti kesî.

**Tu xêr ji bazara xwe bikî:**
-Madem ku tu guhê xwe nadî min ka tu çawa dizanî wisa bike; elaqeya min bi te nîne; tuyê poşman bibî lê tu dizanî.

**Xwe li erdê xist:**
- Hêrs bû; pir israr kir.

**Yan heca min yan jina min:**
- Divê ji her du karan yek bê kirin.

**(Zilamek jina wî miriye, ji zaroyên xwe re dibêje; ji min re jinekê bînin. Zaroyên wî jê re dibêjin; bavo, tu kal bûyî, ji xwe re biçe hecê baştir e. Lê çawa ku jinê jê re naynin, naşînin hecê jî; bavê wan jî her tim dibêje; yan jina min, yan heca min)**

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Avakirin û xebata Desteya Edaletê hêviya hemû civakê ye'



Parlementera Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (Partiya DEM) ya Erziromê û endama Desteya Edeletê ya parlementa Tirkiyê Meral Daniş Beştaş diyar kir ku merasîma îmhakirina çekan a koma Aştî û Civaka Demokratîk ne radestîbûn bû û wiha got: "Ev pêvajo, pêvajoya çareseriya sedê salan e."**R-5**

## Telet Yûnis: Hêzên hegemon li ser xaka Sûriyê bazariyan dikin



Endamê Meclisa Giştî ya PYD'ê Telet Yûnis destnîşan kir ku êrîşên hikûmeta veguhez a Şamê li ser Durzî û Elewiyan encama hişmendiyeke olperest û nijadperest e û wiha got: "Hêzên hegemon vê rewşê weke firsendekê dibînin û ji bo berjewendiyên xwe li ser xaka Sûriyê bazariyan dikin."**R-3**


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1293 | 27-Tîrmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# RÊVEBERIYA XWESER HÊVÎ Û BAWERIYA GELÊN SÛRIYÊ YE

Sikretêrê Partiya Dîmokrat a Kurdistanê li Sûriyê, Ciwan Siko destnîşan kir ku dewleta Tirk û hikumeta veguhêz a Şamê berê Sûriyê didin parçekirinê û wiha got: "Hikumeta veguhêz a Şamê nikare gelên Sûriyê hembêz bike û xeta ku Colanî li ser dimeşe wê encamên pir xerab bi xwe re bîne. Îroj Rêveberiya Xweser hêvî û baweriya gelên Sûriyê ye."**R-4**




## Projeyên Koparatîf; Avakirin û bihêzkirina aboriya civakî ya komînal e



Endama Aboriya Kongra Star li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rozelîn Bekir diyar kir ku projeyên koparatîfên jin, roleke sereke di pêşxistina aboriya jin û civakê de dilîze û got, "Armanc, avakirina aboriya civakî a komînal û bihêzkirina aboriya jin e".**R-2**

## Ji çiraxên wêjeya kurdî



Helbestvanê Kurd Ferhad Merdê yek ji van helbestvan û welatparêzên hevdem e ku dixwazin mîrasê wêjeyî, hunerî, nasnameya netewî, mîrateya wê ya çandî û şaristanî biparêzin, hem jî gel teşwîq dikin ku her tim xebat û têkoşînê bikin.**R-7**

## 'Komkujiya Taxa Xerbî bi destê tirsonekan hat pêkanîn'



Ebdilrehman Ebdê bavê şehîd Zinar Ebdê ku yek ji şehîdên teqîna Taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo ye, diyar kir ku teqîn bi destê tirsonekan pêk hat. Herwiha Ebdê destnîşan kir ku lawê wî Zinar dema dikan vedikir teqîn çêbû û roja din dema ku dayika wî li nexweşxaneyê ew dît, piştî gelek axînan şehîd bû.**R-6**



**Gelo Tom Barrack li çi digere?**
Ahmet Aktaş R-4



**HTŞ Xwestiye Piştî Siwêda Êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bike!**
Idrîs Henan R-5



**Vegera li xwe**
Remezan Olçen R-7

# Bangên avakirina lêpirsîneke navdewletî û cezakirina sûcdaran

**Jinên bajarê Qamişlo komkujiyên ku derheqê pêkhateyan tê kirin şermezar kirin û wiha anîn ziman: "Divê lêpirsîneke navdewletî ji bo cezakirina sûcdaran û pêkanîna edaletê pêk were herwiha bi awayekî bilez van komkujiyan bidin rawestandin."**

Lîloz Hisên/Qamişlo

Ji dema hilwişandina rêjîma Baas heya niha, bi hincetên derewîn desthilata Şamê ya veguhêz pêkhateyan qir dike. Di destpêkê de bi hinceta bermahiyên rêjîma berê pêkhateya Elewî dan qirkirin û bi awayekî hovane jin, mêr, zarok û kesên bi temen mezin bê guneh bi awayên dijî mirovahî kuştin, paşê berê xwe da gelê Durzî bi hincetên cuda dûrî rastiyê û desrxistin xîtaba nefretê ku pêkhateyan li dijî hev ra dike.

berya 15 rojan desthilata Şamê bi hêzeke mezin berê xwe da bajarê Siwêdayê ku tê de gelê Durzî dijî, dixwest ku bi yek rengî hukmê xwe li ser wan ferz bike, lê îrade û hêviyên gelê bajar berovajî pilanên hikumetê ye, ji ber ku ew jî banga Sûriyeke nenavendî û demokratîk bê avakirin; dikin. Komkujî û qirkirinên hovane bi serê vî gelî pêk hat û heya niha berdewam e, tevî raghandina agirbestê, lê bi



Sefa Siltan

pilanên qirêj hîn desthilata Şamê hêzên xwe gur dike ji bo êrişan li ser Durziyan pêk bînin.

Derbarê vê mijarê de Komîteya Jin di Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya kantona Cizîrê Sefa Siltan destnîşan kir ku komkujiyên li dijî Durziyan û tevahî gelê Sûriyê tê kirin sîstematîk in û wiha got: "Ev komkujî tevna Sûriyê bi giştî hedef digre, êdî wê bibe sedema şerê navxweyî di navbera hemû pêkhateyan de rû bide. Bajarê Siwêdayê ev demeke li hember êrişeke mezin tên ku jin, mêr, zarok û kesên bi temen mezin hedef digre herwiha malên sivîlan û nexweşxaneyan bomberan dikin ev



Siltanê Xişo

kiryara binpêkirineke li dijî mafên mirovahiyê ye."

**'Mîna rêjîma berê desthilata veguhêz tev digere'**

Sefa Siltan diyar kir ku di çarçoveya bûyerên ku em tê de derbas dibin hîn rewş ne zelal e û wiha anî ziman: "Hikumeta Sûriyê ji destpêka hatî ser serweriyê destûrek nivîsand bi şiklê yek rengî û pêkhateyên dîtir dûrxistin û mîna rêjîma berê tev digere. Em hêvî dikin ku desthilata Şamê li nêrînên gel guhdar bike û temsîla wan bike, Sûriyeke cihêreng ku her kesî qebûl bike bê avakirin. Divê destûrek bê avakirin ku mafê hemû pêkhateyan misoger bike di bin siya welatekî azad û demokrat de."

**'Hikumetek yek reng di welatê pirreng de, tehlukeye'**

Rêveberiya Weqfa Jina Azad a Sûriyê Siltan Xişo destnîşan kir ku li Sûriyê rewşeke pir hesas û xeter tê jiyan kirin û wiha got: "Hikumetek ku bi yek reng û dengî welatekî ava bike û di nava welat de zêdetirî çend pêkhate, ol û mezheb hebin û pirreng be, tehlukeyeke. Ji dema desthilata veguhêz hat ser hukimê dewletê bi hincetên derewîn qetlîama li ser pêkhateya elewî anî, piştre jî berê xwe da gelê durzi ku dixwaze heman komkujiyan pêk bîne, ji bo hikumetek yek rengî raghîne û pêkhateyên dîtir dûr bixe. Êrişa ku hikumeta veguhêz pêk anî bi xwe re gelek komkujî anî bi awayên cuda zarokên bê sûc, sivîlên ku qet ranehiştine çekan, jin û kesên bi temen mezin hatin kuştin çi bi şewitandin, serjêkirin û kuştina meydanî heman hişmendiya DAIŞ'ê."

**'Em banga avakirina komîteyeke navdeweletî ji bo lêpirsînê dikin'**

Siltanê Xişo di dawî de bang kir ku komîteyeke navdewletî ji bo lêpirsînê bê avakirin û sûcdarên komkujiyan bên darizandin û wiha gotina xwe qedand: "Komkujiyên hatin kirin tirsekî di nava pêkhateyên din de çêdike herwiha baweriya gel bi hikumetê winda dibe û dihêle pêkhate jî ji hev ne bawer bin. Divê desthilata Şamê qebûl bike ku Sûriyê pirreng e nabe bi yek rengî dewletê ava bike, her kes bi zimanê xwe deng û rengê xwe, karibe nêrînê xwe bîne ziman; jiyan bike. Bi vê yekê gerek hikumet gavan bavêje."

# Projeyên Koparatîf; Avakirin û bihêzkirina aboriya civakî ya komînal e

Esma Mistefa/Qamişlo

**Endama Aboriya Kongra Star li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rozelîn Bekir diyar kir ku projeyên koparatîfên jin, roleke sereke di pêşxistina aboriya jin û civakê de dilîze û got, "Armanc, avakirina aboriya civakî a komînal û bihêzkirina aboriya jin e".**

Di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de xebatên ji bo pêşxistina aboriya jin tên kirin, yek ji wan xebatan jî pirojeyên koparatîfa jin in. Têkildarî vê mijarê Endamê Rêveberiya Aborî a Kongra Star Rozerîn Bekir bersiva pirsên Rojnameya me dan.

**Jin di hemû qadên jiyanê de rolên sereke werdigirine ser milê xwe, di aliyê bihêzkirina aboriya jin û bi taybet xebatê koparatîfa jin de li ser asta herêmê Xebateke çawa tê meşandin?**

Ji destpêka herikîna xebatê Kongra Star di Şoreşa Rojava de Li kêlek xebatê rêxistinî aboriya jin hat birêxistinkriin û ji bo pêşxistina jin di aliyê aborî de gelek xebat hatin destpêkriin. Bingeha xebatê aboriya jin bi çandiniyê dest pê bû û hêdî hêdî pirojeyên xwe geşkirin û zêdekirin.

Komkirin û civakbûyîn jî ji destpêka civaka xwezayê ve, tê zanîn ku li derdora jinê tê gerandin. Em jî li ser van esasan bi pêşxistina xebatê aborî û pirojeyên koparatîf, careke din civakbûyînê li ser esasê alîkarî û hevgirtinê didin avakirin. civak qezenc dike û bi xwe xwe pirojeyên xwe didin avakriin. Em jî Kongra Star bi rêya komîn û meclisan aboriyekî komînal di nava civakê de birêxistin dikin.

Rêbertî wiha dibêje "Aboriya herî saxlem bi destê jinê tê avakirin" Di heman demê de bal dikşîne ku yekemîn jin ji aboiyê derxistin û duyemîn jî karker û cotkar durxistin. Em jî li ser esasê vegera li mîrasê vê yekê kar dikin. Hişmendiya ku li jinê hatiye sepandin ku li dûrî aboriyê ye, jin nikare xwe bi xwe birêve bibe û pirojeyên xwe avabike; em radikin.

Di roja heyî de divê jin ji her kesî bêhtir cihê xwe di nava aboriyê de bigre û sîstema komîna bi pêş bixeye, ji ber a herî zêde zirar ji hişmendiya serdest û zayendperest di dîrokê de dîtiye, jin e.

Di aliyê din de em xwe weke berpirsyarê xweza û ekolojiyê dibînin, parastina jîngehê jî yek ji erkên me ne, ne tenê jin hemû civak berpirsê parastina ekolojiyê ye. vê yekê jî em di pêşengtiya jinan de dikin, ku niha xwezaya cîhanê gellek zirar û desdirêjî lê hatiey kirin. Aboriya jin jî xwe li hember parastina vê yekê berpirisyar dibîne ji ber wê jî em cihê xwe di Bilatforma Jin a ekolojîk ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê de digrin. Parastina ax, av û xwezayê yek ji stratejiyê xebatê me ye.

**Projeyên we yên koparatîf di asta hemû herêman de çi ne û hûn çawa dinirxînin?**

Xebatê koparatîf de gelek pirojeyên demkî û dem dirêj hene. Li ser asta herêmê di van demên dawiyê de nêzî 50'î projeyên me yên koparatîf hene. Di asta yekemîn de pirojeyên çandiniyê herî zêde hatine pêşxistin, her wiha di nava bajar û navçeyan de pirojeyên rojane karkirin tê de hene. Ji wan firin û tenûr, cihên dirûnê ne. Di heman demê de pirojeyên zêdekirina daran heye, her sal erdên ku dar lê werin çandin zêde dibin û tên xizmetkirin. Ji wan jî herî zêde darên zeytûn û fêkî ne.


Ji bo hîn zêdtir projeyên koparatîf encam bibin û zêde bibin di salên borî de hin biryar bi taybet ji bo çandiniyê hatin standin ku piraniya erdên çandiniyê em ji bo sebzeyên havînê jî bikar bînin. Li ser wê esasê li hemû herêman zêdetir sebze hatin çandin. Di heman demê de da ku ev piroje bi ser bikeve, pêwîstî bi koladnina bîran hebû, ew jî hate pêkanîn.

Xala esasî ku pirojeyên koparatîf her koparatîfek meclisa wê çêdibe û bi hev du re biryarên xwe distînin û biryar digrin. Bi vê yekê dikarin li ser esasê kom li hev du bicivin û xebatên xwe bidin meşandin.

**Di van projeyan de çiqas jin û malabat cihê xwe tê de digrin. Armanca we ji vê xebatê çi ye. Her wiha astengiyên tên dîtin çi ne?**

Di nava van pirojeyan de bi sedan malbat û jin cihê xwe tê de digrin, di van demên dawiyê de nêzî 400 kes cihê xwe di pirojeyên ku me anîne ziman de cih digrin, jê sûdê werdigrin û ji wan re dibe weke jêdereke madî a jiyanê. Bi rêya van pirojeyan aboriya xwe a malbatê îdare dikin û sûdê dibînin. Li hemû herêman proje û komîteyên me yên aborî hene.

Armanca me ji vê xebatê em bikaribin jinan di xebatê aborî de bi pêş bixînin, her wiha jin xwediyê aboriya xwe be. Ji ber aboriya jin beşek ji pêşketinên Şoreşa Jinê ye, divê jin jî xwe di wî warî li gorî ku tê xwestin xwe pêş bixîne. sîstema aboriya komînal bê pêşxistine. Di



van salên derbasbûyî de gelek jin hatin perwerdekirin û demê re bûn pêşengên birêvebirina aboriya jin. Ya din bi jin bi pêşxistina aboriya xwe serbixwe dibe û pêdiviyên xwe yên jiyanê û malbatî bêyî ku xwe ayidî kesekî bibîne; pêk bîne. Di heman demê de armanca me a sereke sîstema aborî a komînal di civakê de bi pêş bikeve, ev yek jî bi rêya çandiniyê hat destpêkirin û niha jî pirojeyên mezin hatine avakriin. Ev yek dibe bingeh ji xweserbûn û xwebûna jinê di hemû ware jiyanê de, dibe destek û alîgir di rêvebirina şexsî û civakî de.

Her wiha em ê bi van xebatan aboriya xwe a xwecihî û têrkerî bêyî ku em hewcedariya derve bibin, wê bê avakirin. helbet em ji van proje û koparatîfan jî encamên erênî di aliyê bicihkirina pêdiviyên herêmî de dibênin. Emê bikaribin bi van piroje û xebatan piştgirî û pêşxistina berhem û sûka civakî bikin.



# Ji çiraxên wêjeya kurdî

Can Yûsif

Helbestvanê şoreşger Ferhad Merdê Helbestvanê şoreşa Rojava û dengê şoreşa azadiyê.

Rola helbestvanan di serdema nûjen de di wêjeya kurdî de pir girîng e, ji ber ku ew nûnertiya dengê ku derbirîna hest û ramanên mirovan dike û ew mîrateya gel û dîroka wan vediguhêzin û di heman demê de ew dixebitin ji bo xurtkirina hişmendiya çandî û neteweyî ya gelê Kurd û hewldidin ku peywira xwe ya çandî û siyasî ji bo girseya gel ragihînin.

Rola helbestvanên kurd di lêgerîna hişmendiya giştî û banga yekîtiya neteweyî ya gelê Kurd de girîng têne hesibandin û ew dixebitin ku nirxên mirovan, demokrasî û azadiyê di civakê de xurtbikin û nasnameya neteweyî û çandî ya gel biparêzin.

Helbestvanê Kurd Ferhad Merdê yek ji van helbestvan û welatparêzên hevdem e ku dixwazin mîrasê wêjeyî û hunerî û nasnameya netewî û mîrateya wê ya çandî û şaristanî biparêzin û gel teşwîq dikin ku hertim xebat û têkoşînê bikin da ku bigihîjin mafên xwe yên rewa ji azadî û serxwebûnê.

Helbestvan û nivîskarê kurd, Ferhad Merdê (Mihyedîn) ji dê û bavekî kurd (Şukrî û Letîfa) di sala 1975'an de li taxa Hilêliyê ya bajarê Qamişlo ji dayik bûye, bajarê tijî hezkirin û biratiyê, minareya Zanîn û Zanistê, dîdargeha Hunermend û helbestvanên xwedan çand û olên cuda yên mîna (Mihemed Şêxo, Aram Tîgran û Cegerxwîn û Mela Ehmedê Palo) û jêdera ilhamê ji bo gelek helbestvan û afrîneran, ew di nav malbateka neteweyî ya Kurdî de mezin bû ku girêdayî bi nirxên kurdewarî û evîndarê azadî û aşitiyê, ku ji heft zarokan (sê keç û çar xortan) pêk tê, ji ber hestê xwe yê welatparêzî û evîna wî ji bo welatê xwe û gelê xwe, ew hîn di ciwaniya xwe de beşdarî nav refên Tevgera Rizgariya Kurdistanê bû, bi destekî çek û bi destê din pênûsê radike û da ku bibe dengê berxwedanê, şepêlek ji bo şerê azadiyê li dijî koledaran û dagirkeran û bibe peyamdarê hişyariyê bo gelê xwe.

Meylên wî yên hunerî û wêjeyî û hezkirina wî ji bo muzîka kurdî, şano û lêxistina defê, di temenek piçûk de dest pê kir, hîn di sêzdeh salaliya temenê xwe de, ji kûraniya dilê xwe ew bi rewşa xirab û mercên dijwar û her deverê dorpêç kirin ku gelê kurd tê de dijî bandor bû. Ji nav dijwarî û zehmetiyan, hêvî derdikeve; ji kûraniya êşê, îrade tê afirandin û ji dilê felaketan, afrînerî tê zayîn. Di nav van trajediyan û mercên êş ên ku welêt têre derbas bû, helbestvan Ferhad Merdê mezin bû û hişmendiya wî ya bedewî û çandî hate avakirin, wî hinêra xwe ya hunerî, torevanî û çandî bi xwendin û lêkolînê pêşve bir. Di sala 1995'an de, wî dest bi rêwîtiya xwe ya torevanî kir bi nivîsandina helbesta klasîk, ya terazû, li gel helbesta azad û pexşan, bi karanîna zimanê kurdî wek amûrek ji bo vegotinê û afirîneriyê. Helbestên wî dengvedanek berfireh girt di nav cîhana hunerî de, ku gelek hunermendên mezin ên kurd û komên hunerî yên naskirî, helbestên wî kirin stran û di albomên xwe de weşandin mîna :

1-Hozan Comerd ( Hêviya dilê min)
2-Xêro Ebas (Gula bexçê welatê min - Wa bilûrvano - Derdên dilê min pirin)
3-Hikmet Cemîl (Hozanim dilkovanim)
4-Şehîd Delîle ( Zîlan)
5-Hozan Sosin ( Newroz çiye.. berxwedane)
6-Hozan Farqîn(Gulê Canê)
7-Selah Resûl (Esmer)
8- Koma Serdem (Leyla Guven -Welatê min - Buhara welatê me û Em Nadin)
9- Koma Zîlan ( Waşokanî )
10- Koma Amara ( Apo tu rojî).

Ji bilî serpêhatiya wî ya helbestî, helbestvan Ferhad di warê tiyatroyê de jî gelek nivîsar û senaryoyên şano û skêçan nivîsandine ku ji aliyê komên hunerî yên cuda yên kurdî hatine pêşkêşkirin. Ji xebatên wî ên herî navdar ên tiyatroyê ku wî nivîsî, derhênerî jêre kirî û di wan de beşdar bûyî, ev in:

1-Şanoya " Dîno - muzîkal" ku dengvedanek da û di festîvala Hewlêr û Amedê de hat pêşkêşkirin.
2- Şanoya "Şehîd Zîlan"
3- Şanoya "Buxcê Welatê Min"
4-Şanoya "Silo" kurte fîlm.

Di domahiya 30 salan ji fedekarî û dayînê, helbestvan Ferhad roleke girîng û çalak di dîmena neteweyî û çandî de lehîst, di riya pêşkêşkirina bernameyên gelek çalakiyên neteweyî û ahengên niştimanî, wek Cejnên Newrozan, Bîranîna damezrandina partiyê, Pêngava15'ê Tebax ê, Tîwanên Şehîdan, Roja Rojnamegeriya Kurdî û bîranînên nivîskar û helbestvanên kurd bê sekin û westan, bi helbestên xwe yên nazik û hîsdar û bi şêwazê xwe yê bi bandor ku şopeke kûr li ser bîra temaşevanên xwe û wijdana gelê xwe hişt. Ew beşdarî gelek bernameyên televîzyon û radyoyê de, li ser ekranê kanalên wek (Ronahî, Rojava, Stêrk, Çira TV, Arta û Vedeng) û bernameyên wek "Xemla Hunerê", "Bernameyên Guhdaran) bû.

"Sefqan û Mêvan",Nûroj" û bernameyên din ku destlêdana nebeza kolana Kurdî û derdên wan yên rojane dikin. Ne tenê ew beşdar bû, lê di heman demê de wî gelek bernameyên TV-yê li ser ekranên kenalên Kurdî jî pêşkêş kir di nav de:

1-"Gul Firoş" – li Rojava TV
2-"Buxcê Zarokan" – li Stêrk TV
3- "Gundê Me" – li Ronahî TV.

Helbestvan Ferhad Merdê bi gelek hunermendên Kurd û komên hunerî re, beşdarî karekî hevbeş bûye, bi helbestên xwe ligel stranên wan û di ezmûnekê de ku peyv û awaz, helbest û stran bi hev re kom kirine bi rengekî duet û komî helbest û stranan bi hevre gotine û ji nav wan ên herî navdar evin:

1-Koma Serdem
2-Hûjîn Hêris
3- Sefqan Orkîş
4-Hikmet Cemîl
5-Farqîn Azad
6-Koma Zîlan
7- Koma Penaber
8- Melik Rojhilat
9- Koma Botan

Wî gelek xelat ji derdorên hunerî, wêjeyî û malperên medyaya civakî wergirtine .

Ferhad Merdê helbestvan û hunermendekî kurd e, ji bajarê Qamişlo ye, ew tê nasîn bi helwesta xwe ya neteweyî û piştgiriya xwe ji doza gelê kurd re, bi taybetî li Rojava ,ji ber vê yekê tê bi navkirin bi "helbestvanê şoreşa Rojava" ji ber beşdariyên wî ya helbestî û hunerî di şoreşê de ku wî êş û hêviyên gelê kurd vegotin.

Di sala 2022'an de, Ferhad Merdê gazî hunermend û rewşenbîrên Kurd kir da ku piştgiriyê bidin berxwedana Gerîlayên Kurdistanê û bal kişand li ser giringiya yekîtiyê û hevgirtinê li dijî pirsgirêkên ku li hember gelê Kurd rû didin.

Ji ber helwestên wî yên sîyasî û çalakiyên wî yên hunerî û torevanî, helbestvan Ferhad Merdê û Hevalên xwe hatin armankirin ji hêla dronekê Tirkî ve li bajarekî Rojavayê Kurdistanê, evê yekê semboliya wî zêde kir wekî helbestvanekî berxwedêr, şoreşgerî û neteweyî. Helbestvan Ferhad gotinên wî wek avê xwêz in, bi hêvî û rûmet diherikin dilan; tîpên wî xweşik in, mîna xêzikên ku ji ronahîyê têne hûnandin, ku birînan derman dikin, bi his û hestan diaxivînin û bi rastî xwe berdidin giyan, hevokên wî li ser jiyanê pir xweşik in û tîpên wî hêsan in, lê her wiha di nav wan de pir wateyên giran hene ku peyvên derbas dikin û şopekî li ser wijdan dihêlin û nayê jibîrkirin.

Hinêra Ferhad Merdê ya hunerî û wêjeyî tenê bi nivîsa helbest, şanogeriyê û karanîna rîtmayê "Defê" sînordar nema, ji wan derbas kir, her weha di warê awazdêneriyê de jî xebitî, wî gelek helbestên xwe awaz ji wan re çêkirin û ji hêla hunermendên mezin ên Kurd û komên hunerî yên kurdî ve hatin pêşkêş kirin, mîna:

1-Ey gula buxçê welatê min
2-Apo Helbestek bë dawiye.
3-Buhara min.
4- Rondik
5-Ji tere bes

Helbestvan Ferhad Merdê yek ji dengên herî girîng ên helbestî ye ku derbirîna armancên şoreşê û tevgera girseyî dike di kûrahiya helbestên wî de dengê birînek vekirî, axîna êşa neteweyekê ronî dike, di sirûdên wî de qêrîna jiyanê û dengdana rastiyê ya nûdem ku bi zimanekî helbestî xweşik û rewahekî bedew tê pêşkêşkirin. Ferhad Merdê helbestvanekî afrînere, xwedî peyvên şêrîn û hestên bedew e, ew dikare peyvan bike çiraxên ronahî di tarîya şevreşan de û dikare bi tîpên xwe yên nazik gelek wateyên xweşik bixêze, ruhê wî yê nazik û hestewar her dem li her helbestê û li her malikekî ku dihûne tê dîtin. Gelek helbestên neteweyî, şoreşgerî û romantîk li ser welat û berxwedanê, li ser şehîd û şoreşgeran, li ser serok û milîtanan, li ser çiyayên Kurdistan û xwezaya wê



ya bedew; li ser bajarên berxwedêr yên Kurdistanê, li ser Kurdistanê û bedewiya wê, li ser sitemkarî û zordariyê, li ser jin û şoreşê li ser evîn û heskirinê nivîsandine.

Ji karên wî yên edebî ku hatine çap kirin, berhevokek helbestî bi zimanê kurdî bi navê (Kesera Azadî) û berhevokek nû ya helbestê jî li benda çapê ye...!!

Ji navê klîpên wî yên navdar ji helbestên wî yên bi dengê xwe tomar kirin û li ser malper û kanalên televîzyonê hatine weşandin evin:

1-Însane
2-Yadê
3-Gul Firoş
4- Lawikê Koçer
5- Serokê Min
6-Bêriya Te Dikim
7-Ji te Hez Dikim
8-Ji bo Garê
9- Cenga Zagros û Xabûr
10- Sibe Belkî Tu Min Nebînî
11- Ma Ku Tu Li Ver Ba
12-Şengal
13-Kobanê
14-Heval
15-Serê Kaniyê
16-Efrîn
17-Berxwedana Hesekê
18-Her
19-Ey Şehîd
20-Esmer

Helbestên wî çîrokên ku dil û cegeran disojînin û hêstiran ji çavan dibarînin û dîroka gelê kurd ji demên kevnar ên ku di bin giraniya neheqî û zordestiyê de xeniqîne vedibêjin, helbestên wî ji bo qahreman û şahiya serkeftinê têne strandin .

Ferhad Merdê wek dengê hunerî û mirovahî tê nasîn, ku êş û hêviyên gelê kurd vedigotin, bi riya helbest û hunera xwe hewl dide ku bûyerên dîrokî belge bike û banga yekîtî û berxwedanê dike. Helbestvan Ferhad ne tenê serhildêrek neteweyî an nivîskarek şoreşger e, lê ew çemek hişmendiye diherike, çavkaniyek zanebûnêye zuha nabe, sînorên cîh û demê derbas dike...

Helbestvan Ferhad Merdê, stûnek edebî yê neteweyî ya afirîner e ku di dewlemendiya hunera kurdî û wêjeya Kurdî de bi gotinên xwe yên şêrîn, tîpên xwe yên bedew û bi şanoyên xwe yên bi armanc û raman, rolek girîng lîstiye. Helbestvan Ferhad Merdê dê bimîne wek çavkaniyek ku ava wê qet namiçiqe, û wek çiraxek ku ronahiya wî qet navemire, hêviya serkeftinên zêdetir, afrînerî, ronakbûn, saxî û jiyana dirêj jê re dixwazim..



## Vegera li xwe

Remezan Olçen

Çend roj berê min nivîseke şehîd Alî Haydar Kaytan xwend. Di rojnameya Yenî Yaşamê de hatibû weşandin. Xuya ye ji ber axaftin yan jî dersekê wî yê perwerdeyê hatiye girtin. Zimanê xwe sade bû. Weke çawa em bi hev re diaxivin nivîsîbû. Lê nivîseke têra xwe kûr bû û gazî xwendevanê/a xwe dikir ku li ser xwe, li ser hebûna xwe, li ser gund û bajar û welatê xwe bifikire.

Digot; "Berê ez ji gundê xwe aciz bûm. Min timî digot, em li van çiya û baniyan li çi digerin." Bi rastî dema ez difikirim bi min re jî ev hîs çêbûye. Min jî car bi car ji xwe re digot. Paşê weke ku Alî Haydar Kaytan dibêje; Rêber Apo çavek dî bi min ve kir û min bi wî çavî li gundê xwe mêze kir. Min wê gavê xweşikahiya wî dît, min hingê xwe dît. Ev vegera li xwe, vegera li koka xwe bi serê xwe şoreşeke mezin e.

Îcar li vir ez ê mînakek ji pirtûkekê bidim ku nivîskara wê jineke hêja û berxwedêr bû; Sîmone Weil. Pirtûka wê; Bêkokbûn behsa wê yekê dike ku serdest bi çi rengî û çawa me ji kokên me dikin. Ev kok helbet dema mirov lê difikire, ax e. Ji ber ku em encax li ser ax û koka xwe berdin. Lê xanima Weil tişteke din dibêje; ya ku ew dibêje hîn balkêştir e. Dibêje; mirov çiqas temaşeyê heqîqeta xwe bike ewqas li koka ku rehên xwe, yanî li xwe vedigere. Li gorî wê ax giring e, lê koka ku mirov di zîhniyeta xwe de berdide kûrahiyan hîn giringtir e. Serdest pêşî bi zîhniyeta bindestan dilîzin. Dixwazin wê zîhniyetê şîlo bikin. Xwediyê zîhniyetê xwe kêm û bi qisûr dibîne. Tişta ji xwe re weke qirsûr dibîne; koka wî/ê ye. Nirxên civakê ya bi hezarê salan e. Ziman e, çand û huner e, dîrok e, dab û nêrît e. Li xwe kirine cil û bergên xwemalî ye. Ji ber vê jî Sîmone Weil bi pirtûka xwe me vedixwîne ku em pêşî koka xwe di zîhniyeta xwe de berdin, weke ku şehîd Alî Haydar Kaytan dibêje; bi çavê xwe li xwe, li civaka xwe, li welatê xwe binêrin. Ji ber ku bi çavê serdestan dema mirov li xwe binêre tişta ku mirov bibîne ji kêm û qisûran wêdetir ne ti tiştek e. Bûyîna xwedan kok giring e. Dara me ya hebûn û azadiyê dema li ser axa xwe şîn bibe, koka xwe di kûraniya wê axê de berde wê fêkiyên xwe jî bi tahm û çêj bin lê heke ku ev dar û kulikl li biyanistanê be wê fêkiyên xwe jî tahm sar bin. Wê hîbrît be, bê dendik û kakil be. Axa xwe em behsa wê dikin jî destpêkê zîhniyet e. Divê zîhniyet, mêjî û dilê me li xwe vegere.

Em li ware şoreşê dibin şahid ku civak kok û rehên xwe parastiye. Em dibin şahid ku di salên derbasbûyî de dema ev dar bi ava şoreşê hat avdan çawa geş bû û fêkiyên çawa tamxweş dan. Civaka şoreşê bi çavê xwe li xwe dinêre, bi çavê xwe, xwe dibîne. Bi mêjî û dilê xwe bi heqîqeta xwe re ye. Rastîn û heqîqî ye, ne tiştekе mecazî û qelp e. Ev kok çiqas bi kûraniyan de here wê vegera xwe li û xwebûn ewqas qewîn bibe. Wê hebûn û xwebûn bi ziman, çand û hunerê, bi poetîka û polîtîkayê her û her azad bijî.

# ‘Komkujiya Taxa Xerbî bi destê tirsonekan hat pêkanîn’

Ebdilrehman Ebdê bavê şehîd Zinar Ebdê ku yek ji şehîdên teqîna Taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo ye, diyar kir ku teqîn bi destê tirsonekan pêk hat. Herwiha Ebdê destnîşan kir ku lawê wî Zinar dema dikan vedikir teqîn çêbû û roja din dema ku dayika wî li nexweşxaneyê ew dît, piştî gelek axînan şehîd bû.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Di 27’ê Tîrmeha 2016’an de çeteyên DAIŞ’ê li taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo bi kamyoneke bombebarkirî êriş pêk anî. Di encama vê teqînê de, 62 kes şehîd, 177 kes jî birîndar bûn herwiha zirar gihaşt mal, milk û dikanên welatiyan. Şehîd Zinar Ebdê yê 16 salî bû roja piştî teqînê şehîd bû, derbarê teqînê û şehadeta Zinar Ebdê de bavê wî Ebdilrehman Ebdê ji rojnameya me re axivî.

**‘Komkujî bi destê tirsonekan pêk hat’**

Bavê Şehîd Zinar diyar kir ku teqîna Taxa Xerbî bi destê tirsonekan pêk hat û wiha got: “9 sal li ser teqîna Taxa Xerbî re derbasbûn, ev komkujiyek bû di derheqê gelê Kurd de, çeteyên DAIŞ’ê bi vê teqînê kiriyareke xedar bû û ev yek bi destê tirsonekan pêk hat. Wekî em dizanin destê dewleta Tirk di vê komkujiyê de hebû, bi riya istixbarata xwe û wan navendên perwerdekirina çeteyên DAIŞ’ê yên ku li Tirkiyê hatibûn avakirin, teqîn çêbû. Herwiha bi riya istixbarata rêjîma Baas kemiyoneke mezin a DAIŞ’ê ku gelek madeyên teqemeniyê hildigirt, derbasî Taxa



Xerbî bû û hat teqandin. Çeteyên DAIŞ’ê rû bi rû şer bi gelê Kurd re kirin, bi saya şervanên QSD’ê nikarîbûn bi ser bikevin, lewma dest bi kiryarên teqandin, hedefgirtin û hwd… bi riya dewleta Tirk kirin, di encama wê de jî bi dehan kesên sivîl ên bêguneh hatin kuştin. Di pey wê re DAIŞ bi daxuyaniyekê eşkere kir ku wan kesên murted ango yên derveyî ola islamê kuştin, lê ev sîfet tu caran ne di chiyê xwe de bû, em civakeke aştîxwaz, misilman in û ne li dijî tu olan in.”

**‘Dema ku Zinar dikan vedikir teqîn çêbû’**


Ebdilrehman Ebdê destnîşan kir ku dema lawê wî Zinar dixwest dikana xwe veke, teqîn çêbû û wiha bi lêv kir: “Zinar kurê min yê duyem bû, temenê wî 16 sal bû, dikana min a çaksazkirina beradeyan heye, wî alîkariya min dikir û birayê wî dixwendin. Roja teqîn çêbû, sibehê zû şiyar bû, wekû her carê rahişt bisklêtê xwe û çû dikanê. Wê demê jî birayên wî yên din li pişt wî bi dûrahiya 50 gavî dimeşiyan, dema Zinar gihaşt li ber deriyê dikanê û xwest ku derî veke, teqîn çêbû û derbe ji ser, gurçik, pişt û destê xwe xwar û bi giranî birîndar bû. Birayê wî li min geriya û got birayê min birîndar bû, ez bi dilşewatî û bêpêlav ji mal derketim, nêzî 300 gavan mala me dûrî cihê teqînê bû. Dema ez giham ser laşê kurê xwe, bi dilekî şewat û hêsirê çavan, min dengê xwe hilda û min got ‘Rab’, wî di jiyanê de gelekî guhdariya min dikir, dema ku birîndar bû jî li min guhdar kir û li ber xwe da. Min rahişt wî û ber bi çerxereya Medînet Elşebab ve bir û ambolansayê em birin Nexweşxaneya Niştîmanî ya Qamişlo.”

**‘Rêjîmê bi zanebûn birîndar paşguh dikirn’**

Ebdê da zanîn ku rêjîmê bi zanebûn birîndarên teqînê paşguh dikirin û wiha domand: “Rojeke pir nexweş bû û hertişt di Taxa Xerbî de hat guhertin, derdora cihê teqînê tev hatibû ruxandin, weke roja qiyametê bû. Dema min lawikê xwe bi sînga xwe ve kiribû û ez bi rê ve diçûm, di riya Amûdê-Qamişlo de lingê min li parçeyên mirovan diket. Min Zinarê birîndar bir Nexweşxaneya Niştîmanî ya ku wê demê di bin serweriya rêjîma Baas de bû. Li wê derê hemû birîndarên teqînê dihatin paşguhkirin, di rewşeke wiha mirovî de wan xebatkarên nexweşxaneyê xwe bi mobaylên xwe ve mijûl dikirin û bi hev re dikeniyan. Wê demê min hîs dikir ku tiştê li nexweşxaneyê rûdide, pilankirî ye. Ango rêjîmê dixwest wan kesên birîndar ên ji mirinê xilas bûne, jiyana xwe ji dest bidin. Birîna Zinar pir giran bû, ew ne li ser hişê xwe bû, dinaliya, nediaxivî tenê dengê axînan jê dihat, ev yek wiha domand heya roja din dema ku dayika wî hat, dema ku zanîbû dayika wî hat, dîsa nalîneke dijwar jê hat û şehîd bû.”

**‘Pêwîst e berpirsên teqînê werin cezakirin’**

Bavê Şehîd Zinar, Ebdilrehman Ebdê anî ziman ku berpirsên teqîna Taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo îro cihê xwe di rêveberiya Şamê de digrin û pêwîste ku bên cezakirin û wiha axivî: “Em sersaxiyê ji malbatên hemû şehîdan re dixwazin, malbata me tev bi şehadeta Zinar êşiya û ji bona me şehadeta wî pir giran bû. Rewşa min a tendurstî gelekî xerab e, temenê min 45 sal e, lê nexweşiyên kesên 90 salî bi min re hene, dayika wî jî mîna min nexweş e. Em dizanin ku yên ev kiriyarên xerab weke teqîn û hwd… li herêma me pêk tanîn di wê demê de DAIŞ’ê bû. Kesên ku teqîna Qamişlo pêkanîne îro bi heman hişmendiyê li ser gelê Sûriyê komkujiyan pêktînin. Hêviya me weke miletê Kurd ji fermandarê Giştî yê QSD’ê Mezlûm Ebdî ew e ku bila bi tu awayan serweriya vê hişmendiyê qebûlneke û li hemberî wê têkoşînê bike.”



# ‘Erkê TEV-DEM’ê rêxistinkirina civakê ye’

**Ayşa Silêman/Dêrik**

**Berdevkê TEV-DEM li bajarê Dêrikê Şengîn Omer diyar kir ku erkê TEV-DEM’ê rêxistinkirina civakê ye û çareserkirina pirsgirêkên gel e, da ku civak xwedî bingeh bimîne.**

Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re, ji her tştî zêdetir pêwîstiya civakê bi rêxistinkirinê hebû. Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM jî ev barê giran girt ser milê xwe û dest bi kar û xebatên rêxistinkirina civakê kir. Roj bi roj destkeftiyên gelên Bakur û Rojavayê Kurdistanê zêdetir bûn, pê re jî kar û xebatên TEV-DEM’ê jî berfirehtir bûn.

Di derbarê kar û xebatên TEV-DEM’ê de Berdevkê TEV-DEM li herêma Dêrikê Şengîn Omer ji Rojnameya me re axivî.

**Kar û xebatên TEV- DEM**

Şengîn Omer di destpêka axaftina xwe de behsa kar û xebatên TEV-DEM’ê kir û wiha got: “Piştî meclis hatin avakirin û komîn bûn girêdayî wan, karê TEV- DEM’ê ma yekîtî û saziyên civaka sivîl, êdî TEV- DEM’ê dest bi pêşxistina yekîtiyên heyî kir û yên tune bûn, ava kir. Wek Yektiya Mamosteyan, Yekîtiya Cotkaran, Yekîtiya Karkeran, Yekîtiya Esnafan, Yekîtiya Parêzeran, Yekîtiya Rewşenbîran û Yekîtiya Bijîşkan. Di her beşê civakê de yekîtî hatin avakirin û birêxistinkirin. Armanc jê ew bû ku civakeke bi rêxistinkirî û birêkûpêk were avakirin, da ku şoreşeke serkeftî û bi encam be. Her yekîtiyek karê wê ji ya din cûdatire, mînak Yekîtiya Esnafan, bazarên bazirganiyê ya bajarê Dêrikê nêzî 33 sinif têde hene ev hemû yekîtiyên wan hene û bi odeya esnafan ve girêdayî ne.



Ev yekîtî berdevkên wan hene û dema mijarek çêdibe yekser em têkiliyê bi berdevkên wan re dikin. Her beşek ji yekîtiyan karê wê heye û em wan birêxistin dikin û heger kêmasî hebe em wê kêmasiyê derbas dikin. Mirov dikare bi kurtayî bêje hemû yekîtiyên ku di bin saya TEV- DEM de kar dikin hemû komînin û xwe birêxistin kirine û berdevkên xwe derxistine, herwiha kar û xebatên xwe nas dikin.”

**‘Erkê TEV- DEM çareserkirina pirisgirêkan e’**

Omer diyar kir ku di her warê jiyanê de wê helbet astengî û kêmasî hebin û wiha domand: “Mînaka ber bi çav karmendên ku di bajar de kar dikin hijmara wan gelek in, nabe ku yek di cihekî de kar bike û nebirêxistinkirî be û mafê wan nebe, dema mirov berê xwe dida bazara Dêrikê karmend li bazarê belav bûne, ev karmend ne girêdayî navenda nin, lewma pêwîstî hebû wek nasnameyên kar ji wan re werin çêkirin û wan bi yekîtiya karkeran bidî famkirin, ji wan re zelal bikin dema hûn girêdayî cihekî bin kes nikare mafê we bixwe, dema me ev karmend bi rêxistin jî kirin êdî pêwîstiya wan bi cihekî taybet jî heye da ku têde kom bibin, bi vî awayî tu kes nikare mafê karkeran jî bixwe. Di heman demê de gazin ji ajokarên erebeyan hat ji me re ku cihê ku yekîtiya ajokaran ji wan re nîşan kiribû hatiye xirakirin û pêwîste cihekî din nîşan bikin da ku karê xwe berdewam bikin.”

Berdevkê TEV-DEM li herêma Dêrikê Şengîn Omer axaftinên xwe wiha qedand: “Ez bawerim ku di her şoreşekê de dema civak ne birêxistinkirî be ew şoreş bi ser nakeve, lê dema civak birêxistinkirî be û şoreş li dar bikeve yekser ew civak pişta wê şoreşê digre. Her û her yekîtî di nav piroje û pêşinyarên nû de ne, mînak niha pêwîstiya zêdebûna dikanên pêşesazyê ji pêşesazên bajarê Dêrikê re hebû, me yekser ev yek bi şaredariya bajarê Dêrikê re nîqaş kir da ku em vê pirojê pêk bînin. Di heman demê de ji ber tengbûna sûka Dêrikê û zêde bûna erebeyan em niha kar dikin da ku keraçekî ava bikin ji bo derxistina erebeyan ji nîva bazarê.”



# Telet Yûnis: Hêzên hegemon li ser xaka Sûriyê bazariyan dikin

Endamê Meclisa Giştî ya PYD'ê Telet Yûnis destnîşan kir ku êrîşên hikûmeta veguhez a Şamê li ser Durzî û Elewiyan encama hişmendiyeke olperest û nijadperest e û wiha got: “Hêzên hegemon vê rewşê weke firsendekê dibînin û ji bo berjewendiyên xwe li ser xaka Sûriyê bazariyan dikin.”

**Amara Baran/ Qamişlo**

Dewleta Tirk, DYE û Îsraîlê alozî û kiryarên ku di Sûriyê tê kirin ji xwe re weke firsendekê dibînin û bazariyan li ser xaka Sûriyê û gelên Sûriyê dikin. Endamê Meclisa Giştî a PYD’ê Telet Yûnis divî çarçoveyê de bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha ye:

**-Êrîşên dawiyê yên hikumeta veguhez a Şamê bi destê hêzên derve û bi taybet bi destê Tirkiyê tê meşandin , hûn vî yekê çawa dinirxînin?**

Dewleta Tirk di destpêka alozî û kirîzan de heta niha destwerdanekê dike, îro jî dixwaze ku hikumeta veguhêz a Şamê li gor berjewendiyên xwe bidin meşandin. Bi navê eşîreyan çekdaran kom dikin û êrîşên gelê Dûrzî dikin. Hemû jî ji aliyê dewleta Tirk ve hatine rêxistinkirin. Van êrîşan di encama desthilatdariyeke nû û zîhniyeteke olperest û nîjadperestî didin meşandin. Zîhniyeta hikumeta veguhêz a Şamê ne li gor hêvî û daxwazên gelên Sûriyê ye, parçabûnekî di nav gelên Sûriyê de dide avakirin.

Kiryarên ku îro li Siwêdayê tên meşandin qetlîam û komkujî li ser hebûn û nasnameya gelê Elewî û Dûrzî ye, qetlîamên ku tên meşandin dûrî rastiya gelê Sûriyê ye. Zîhniyeta nîjadperest ya ku tê meşandin bixwe re kûrkirina aloziyan û ne aramiya Sûriyê dide çêkirin, Hikumeta veguhez heta niha tu gavên ber bi guhertineke demokratîk ku tevahiya gelên Sûriyê di avakirina SûriyekE nû de ku hêviyên gelan pêk bîne, nehatiye kirin. Kiryarên ku tên meşandin berdewamiya siyaseta Rejîma Baas e ku nedîtina îradeya gelên Sûriyê bû, ji bo îstîqrara Sûriyê tu gûhertinan bi xwe re çênake berovajî nakokî hên kurtir dibin.

**-Niha ji milekî ve Îsrail ji milekî ve jî Tirkiye û Emerîka bazariya xwe li ser gel û axa Sûriyê dikin li gorê we hikûmeta Şamê ya veguhez çawa di nav van bazariyan de cihê xwe digre?**

Hêzên hegemon û heremî li ser xaka Sûriyê bazariyan dikin, di Rojhilata Navîn û cîhanê de jî hemû hêz li gor berjewendiyên xwe ji bo ji nûve dîzaynkirina heremê bi heman siyasetê bazarî li ser xaka Sûriyê tên meşandin. Li ser hesabê gelên Sûriyê bazarî tên kirin ev jî nakeve bin xizmeta gelên Sûriyê. Tirkiye, Îsraîl û Amerîka ji bo ku desthilata xwe di heremê de bidin çêkirin axa Sûriyê li gor berjewendiyên xwe dîzayin dikin. Bazarî û nakokiyên heyî bandorê li ser aramiya ku di Sûriyê bê çêkirin, dike. Ew jî bi xwe re berdewamiya kurbuyîna aloziyan tîne. Lazime gelên Sûriyê ji bo avakirina Sûriyeke demokrat, yekbûyî û hevgirtina xwe bide avakirin ku bibe diyaloga Sûriyeyê. Hikumeta vegûhêz a Şamê heta niha li gor berjewendiyên gelên Sûriyê tevnagerin. Hemû hêzên ku bi îrada hêzên derve tevdigerin dawiya wan pir zêde narûnê, îro siyaset şaş û qirêj li hemberê îradeya gel tê meşandin.

**-Piştî komkûjiyên li ser Elewî û Drziyan gef li ser Kurdan tê kirin. Ev jî nîşan dide ku xeteriya şerekî navxuyî li holê ye, ev hişmendî Sûriyê ber bi ku ve dibe?**

Êrîşên hovane yên ku li ser gelê Beravê û Siwêdayê tên meşandin ew jî bandora zihniyeteke yek alî û yek reng e ku ji derveyî xwe kesê qebûl nakin. Zihniyeteke olperest, netewperest ku dixwazin Sûriyeke yek reng bidin rûniştandin. Êrîş û kiryarên ku tên kirin çawa ku çeteyên DAÎŞ’ê li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê komkujî li ser gel da meşandin, heman zihniyet û kiryar li Siwêda û Beravê li ser gelê Elewî û Dûrzî jî tê meşandin. Komkujiyên ku tên meşandin ne li gorî çanda Sûriyê ye di bin navê qebîle û êşîrande komkujiyan pêk tînin.

Ji bo Sûriyeke reng îro gef li ser heremên me tên xwerin, siyasetekî ku dixwazin tevlîheviyê di raya giştî de bidin çêkirin ku dibêjin piştî Elewî û Durziyan, Kurd armanc in. Gelê kurd berê jî bi wan kiryaran re rû bi rû mane û berxwedaniyeke mezin dane û didin meşandin. Gelê kurd bi berxwedanî û tekoşîna xwe, DAÎŞ’ê û komên çeteyan têk birin, siyaseta heyî lazime bê seknandin, gelên Sûriyê kiryarên ku li ser gel tê meşandin qebûl nekin. Berdewamkirina êrîş û siyaseta ku hikumeta veguhêz ya Şamê dimeşîne ew komên çekdar yên ku dide meşandin xeterî li ser gelên Sûriyê û pêşeroja Sûriyê dide avakirin. Gelên Sûriyê lazime li hemberî hişmendiya heyî biryara xwe bide û îradeya xwe bide nîşandan ku desthilatdariyekî nû li Sûriyê nayê qebûlkirin. Zihniyetên ku dûrî rastiya gelênSûriyê ne nayê ne qebûlkirin. Hikumeta Şamê ya vegûhez Ji bo avakirina Sûriyekî demokrat li daxwaz û xastekên gelên Sûriyê vegere û îradeya wan esas bigre.

**-Ji bo hevgirtina gelan pêk bê û dawî li hişmendiya qirkirin û qetilkirinan bê erka ku dikeve ser milê Rêveberiya Xweser û gelên Sûriyê çi ye?**

Gelên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê li hemberî êrîşan yekîtî û hêza xwe daye avakirin û li hemberî hemû êrîşan berxwedaniyeke bêhempa daye meşandin. Ew siyaseta ku dixwazin tevlîhevî di heremê de bidin çêkirin tu carî ji aliyê gel ve



neyê qebûlkirin û bi ser jî nekeve, gelên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê bûye nemûne ji tevahiya cîhanê re û ji gelê Sûriyê re jî ku çawa yekîtiya xwe bidin avakirin. Gel tu car rê nede nakokiyên ku dixwazin di nava gel de bidin çêkirin û li hemberî hewildanên êrîşan jî wê berxwedaniyekî mezin bidin meşandin.

Li hemberî rewş û zihniyeta heyî erk dikeve li ser milê tevahiya gelênSûriyê de, lazim e xwe dûrî hişmendî û zîhniyeta netewperest û olperest bixin. Gelên Sûriyê tevahî bi reng û nasnameya xwe dikarin bi hevdûre jiyan bikin. Rêveberiya Xweser ji bo tevahiya Sûriyê nimûne ye ji bo çareserkirina pirsgirêkên Sûriyê de. Çawa li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê hemû pêkhate bi renge xwe û bi nasname û çanda xwe dikarin bi hevdûre jiyan bikin ev nimûne çareseriyê ji bo tevahiya pirsgirêkan. Hikumeta veguhez lazime dev ji wan kiryaran berde bi siyasetekî kul i ser bingeha îradeya gelê sûriyê û avakirina sûriyekî demokrat ku hemû gelan dinav xwe de hembêz bikin.

# Jinên Qamişlo: Azadiya Rêber Apo misogerkirina pêvajoya aştiyê ye

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Jinên bajarê Qamişlo diyar kirin ku êdî pêwîst e Rêber Abdullah Ocalan fîzîkî were azadkirin, ji ber ku azadiya Rêber Apo misogerkirina serkeftina pêvajoya aştiyê ye.**

Di çarçoveya banga Rêber Apo ya “Aştî û Civaka Demokratîk” ku di 27’ê Sibatê de hate kirin û biryara dîrokî ya feshkirina xebata çekdarî ya Partiya Karkerên Kurdistanê, piştî 52 salên têkoşîna li dijî dewleta Tirk a dagireker ku gihaşt armancên xwe di serkeftina doza kurdî de. Îro diyaloga siyasî çareseriyeke bingehîne ji bo doza gelê kurd, lê pirs ew e çima heya niha Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo



Raniya Mihemed Salih

pêk nehatiy!?

Di vê çarçoveyê de welatiya bajarê Qamişlo ya bi navê Raniya Salih diyar kir ku berdewamiya dîlgirtina Rêber Apo, pêşîgirtina çareseriyê ye û wiha got: “Ev 26 salin Rêber Apo di girtîhgeha Îmraliyê de ji bo çareseriya doza gelê kurd û tevahî gelên herêmê têkoşînek mezin dide meşandin, di 27’ê Sibatê de Rêber Apo banga aştiyê raghandin,



Wehîda Hisên Hesen

piştre Partiya Karkerên Kurdistanê banga Rêber Apo pêşwazî kir û bi erkê xwe yê dîrokî rabû. Lê tevî vê yekê dewleta Tirk heta niha tu gavên berbiçav neavêtiye. Niha pêwîst e dimildest Rêber Apo fîzîkî were azadkirin, ji ber ku azadiya Rêber Apo şertek bingehîne ji bo serkeftina pêvajoya aştiyê.”

Raniya Salih axaftina xwe wiha qedand: “Di seranserî 26 salan de gelê Kurd dudilî nebûn di daxwazkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo de, gelek çalakî, kampanî û insyatîf hatin lidarxistin, niha jî gav bi gav em nêzî azadiya wî dibin. Rêber Apo fedekaryeke mezin ji bo azadî û rûmeta me kiriye, bi taybet ji bo jinan. Tu hinceta dewleta Tirk nemaye ku Rêber Apo girtî bihêle, divê gavan bavêje ji bo nîşandana cidiyeta wî di pêkanîna çareseriyê de.”

**‘Rêber Apo hêviya doza gelê Kurd e’**

Welatiya bi navê Welîda Hesen jî tekez kir ku azadiya Rêbr Apo pêwistiyeke rasteqîne ji bo pêkanîna aştiyê li herêmê ye û wiha anî ziman: “Azadiya Rêber Apo destpêkirina pêvajoya aştiyê li tevahî Rojhilata Navîn e. Eger Tirkiyê girtina Rêber Apo berdewam bike, bawerî di navbera aliyan de tune dibe.”

Welîda Hisên Hesen axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Heta niha hikumeta Tirkiyê tu gavên cidî derbarê doza Rêber Abdullah Ocalan neavêtiye, tenê hin name ji rêbertî hatin girtin û hevdîtin li Îmraliyê pê re hate kirin, ji bilî vê yekê tiştek din çênebû, em bi vê qederê razî nabin. Em ê her daxwaz û têkoşîna azadiya fîzîkî ya Rêber Apo berdewam bikin, ji ber ku ew hêviya doza kurdî ye û kilîta çareseriya aştiyê li Rohilata Navîn e.”

# ‘Rêveberiya Xweser omîd û hêviya gelên Sûriyê ye’

Sikretêrê Partiya Dîmokrat a Kurdistanê li Sûriyê, Ciwan Siko da zanîn ku Rêveberiya Xweser omîda gelên Sûriyê ye û got, “Dewleta Tirk û desthilata Şamê berê Sûriyê didin parçekirinê.”

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Ji dema ku rêjîm têkçû û desthilata Şamê ya veguhêz hat ser hikum, geşedanên pir bilez û komkujiyên mezin derheqê pêkhateya Elewî, Durzî û Suriyanî pêk hatin.
Li paşperdeya kiriyarên xerab ên desthilata Şamê gelek hêzên navdewletî hene ku dixwazin gelên Sûriyê qir bikin û siberoja Sûriyê tarî bikin. Li hemberî van kiriyaran jî gelên Sûriyê riya çareserkirina pirsgirêkên xwe, sîstema Rêveberiya Xweser dibînin. Derbarê heman mijaran de sikretêrê Partiya Dîmokrat a Kurdistanê li Sûriyê, Ciwan Siko ji rojnameya me re axivî.

**‘Desthilata Şamê nikarîbû gelên Sûriyê biparêze’**

Ciwan Siko diyar kir ku desthilata Şamê ya veguhêz nikarîbû pêkhateyên Sûriyê biparêze û wiha anî ziman:”Piştî rûxandina rêjîma Baas û hatina vê desthilata nû veguhêz, hêviya hemû gelên Sûriyê ew bû ku rewş were guhertin û armanca gelên Sûriyê ya destpêka aloziya Sûriyê pêk were ew armanca ku ji bo wê, li hemberî tivingên rêjîma Baas rabûn. Lê mixabin rêjîmeke desthilat û dîktator têkçû, li şûna wê rêjîmeke xwedî hişmendiyeke radîkal bi cih bû. Ketina rêjîmê ne ew e dema ku serokê komarê bireve û li şûna wî yekî din were, divabû ku zihniyet were guhertin, hem jî rêzdarî ji gelên Sûiyê re were girtin. Em dikarin bibêjin ku kiriyarên desthilata Şamê û komên çete yên girêdayî wê kiriyarên xerab ji Efrînê li hemberî gelên Sûriyê dan destpêkirin heya Berava Sûriyê, hem jî teqîna Dêra Şamê û pêkanîna komkujiyên li ser Durziyan. Vê desthilatê gelek komkujî û kiriyarên xirab li hemberî gelên Sûriyê pêk anîn, ev yek tekez dikê ku desthilata Şamê nikare bi darê zorê desthilata xwe bidomîne.”

**‘Xeta ku Colanî li ser dimeşe wê encamên xerab bîne’**

Siko destnîşan kir ku xeta ku Colanî li ser dimeşe wê encamên neyînî bi xwe re bîne û wiha domand: “Çendîn dewletên Erebî û piştevanên wî hewldan kirin ku Colanî bikin Ehmed Elşeri, lê Colanî nebû Ehmed Elşeri.Desthilata Şamê ya veguhêz li ser xeta xwe ya taybet dimeşe, ev xet jî ne cihê hêvî û omîda gelên Sûriyê ye. Xeta ku Colanî li ser dimeşe wê encamên nebaş bi xwe re bîne ji ber ev desthilat pirrengiya Sûriyê û mafê hemû pêkhateyên gelên wê qebûl nake. Colanî bi riya mîta dewleta Tirk berê Sûriyê ber bi xerabûn, şerê navxweyî û parçebûnê ve dibe. Hrwiha dihêle ku hin aliyên din vê tevlîheviyê bixe hincet ku destwerdanê bike. Em dibînin ku li Siwêdayê ev kesên ku bi navê eşîreyên ereban kiriyarên xerab dikin, ev kesên wiha di bingeha xwe de çeteyên DAIŞ’ê ne û nûnertiya erebên Bakur û Rojhilatê Sûriyê nakin. Hemû êlên Ereban bi daxuyaniyekê piştgirî dan QSD’ û tekez kirin ku ev kesên wiha nûnertiya pêkhateya Ereb nakin. Di dema heyî de divê desthilata Şamê, hem jî hemû komên biyanî li ser van kiriyaran bên cezakirin.”

**‘Rêveberiya Xweser omîd û hêviya gelên Sûriyê ye’**

Sikretêrê Partiya Dîmokrat a Kurdistanê li Sûriyê, Ciwan Siko da zanîn ku Rêveberiya Xweser omîda gelên Sûriyê ye û wiha got: “Bêguman Rêveberiya Xweser sîstema herî guncav û serkeftî ye ji bo rêvebirina Sûriyê, ev ne gotina gelê Kurd tenê ye, saziyên navnetewî û rêxistinên



civakî vê yekê tekez dikin. Ji ber ku berî rêjîma Baas bikeve û piştî wê jî heya roja îro jî cihê herî bi ewle, herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Herêmeke xwedî ewlehî, xweşî, wekhevî û demokratiyê ye, hemû pêkhate bi hev re xwe diparêzin, hem jî rêvebirina xwe dikin. Ev tecrube tekez dike ku dikare bibe tecrubeyek ji bo hemû deverên din ên Sûriyê. Rêveberiya Xweser îroj hêvî û omîda hemû pêkhateyên Sûriyê ye. Piştî van geşedanên Siwêda û Berava Sûriyê, pêkhateya Elewî û Durzî jî tekez kirin ku Rêveberiya Xweser riya çareseriya hemû gelên Sûriyê ye, niha daxwaza wan ew e ku ev sîstem li gel wan jî pêk were. Li ser asta 14 salan gelên Sûriyê gelekî westiya, gelek kes hatin kuştin, koçberî û komkujiyên mezin pêk hatin. Em êdî bang dikin ku dem dema wekhevî, aramî û rawestandina xwînrijandinê ye.”

# ‘Welatê ku hemû pêkhate û jin lê cih negire, wê seqet bimîne’

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Endamê Yekîtiya Parêzeran a Kantona Cizîrê Xalid Omer diyar kir ku bi van kiryar û nêzîkatiyan hikumeta Şamê ya veguhêz û navendî wê çawa karibe Sûriyeke Demokratîk bide avakirin.**



Di encama berxwedana 13`e salan a li Sûriyê de, sîstema netewperest a rejîma Baas hat hilweşandin. Niha jî hikumeta şamê ya veguhêz li gorî hişmendiya xwe tevdigere û dixwaze ku Sûrirya bi yey reng û netew were avakirin û birêvebirin. Di heman demê de biryarên ku dide, nîşan dide ku Sûriye ber bi sîstemek olperest ve diçe ku li Sûriya nû bi bêdengiya hikumeta veguhêz êriş, dagirkerî, koçberî û kuştin berdewam dikin. Di vê çarçoveyê de Endamê Yekîtiya Parêzeran yê Kantona Cizîrê Xalid Omer ji Rojnameya me re axivî.
Xalid Omer di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Piştî ku rejîma Baas hat helweşandin, bê guman ez wekî hilweşîn nabînim, tenê wekê serok komarê Suriyê hat guhertin, ama pergala siyasî wekî xwe ma. Ji ber vê yekê em nikarin bêjin armanc ango daxwazên şoreşa me hatiye bi cih kirin. perovajî wê em dibînin ku sûrî bi awayekî navendî û olparest tê birêvebirin. Di dema rêjîma Baas de ew nêzîkatiyên olparest zêde tunebûn, lê piştî ku hikumeta Şamê ya veguhêz em dibînin ku nêzîkatî û kiriyarên olparestî zêde bûn. Hikumeta şamê ya veguhêz îro diwaze bi rengekî yel olî û mezheb Sûriyê bi rêvebibe, ji ber vê yekê ev yek bû sedem ku gelek komkujiyên mezin hatin kirin. Ev kiryar jî wê bibe sedem ku şerekî navxweyê di hindirê Sûriyê de were destpêkirin, her wiha komkujî li ser pêkhateyên Elewî, Durzî û xirstiyanan jî hatin meşandin. Bûyerên ku li beravê çêbûn ev yek û nêzîkatiyên çewt tekez dike, ku ev kiryarên ku niha hikumeta Şamê ya veguhêz li ser pêkhateyan û di bin navê îslamiyetê de dide kirin, wê tevahî gel li hemberî wî rabin û nerazîbûna xwe nîşan bidin, di heman demê de wê nikaribe Sûriyake Demokrat bide avakirin û bi rêvebibe.”

**‘Eger rewşa Sûriya bi vî rengî dewam bike wê ber bi parçebûnê ve biçe’**

Xalid da zanîn ku ew konferansa niştîmanî ya Sûrî li ser bingeheke şaş hat lidarxistin û wiha domand: “Konferansa Niştîmanî ya Sûriyê ya ku li ser esasekî şaş hat damezrandin û li kêleka wê destûra ku hate derxistrin, şaş hat dîtin, di heman demê de bandoreke neyinî li ser rewşa siyasî û metrsiyeke pir mezin li ser rewşa gelê Sûriyê cêkir. Li vir hat xuyakirin ku pêşeroja Sûriyê bi rêvebirina hikumeteke bi vî rengî wê tu aramî û ewlehiyê bi xwere neyîne. Ji ber ku me dît ew kesê sûcên şer, qirkirin û komkujiyan pêktînin, niha hikumeta Şamê ya veguhêz erkê rêveberiyê daye wan. Bi vî rengê heyî ger rewş berdewm bike wê Sûriyê ber bi parçebûnê ve biçe.”

**‘Cihê ku jin lê tune be, ew cih seqet dimîne’**

Omer di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Hikumeta Şamê ya veguhêz ger ku van kiryaran dewam bike, wê rê li pêşiya avakirina Sûriyeke demukratîk bigre, ji ber ku çavkaniya pirsgirêka jiyana gelê Sûriyê sîstema navendiya, ev sîstema navendî wê nebe çare ji gelê Sûriyê re. Herwiha em jî dibînin ku di hundirê Sûriyê de her pêkhateyek nayê qebûlkirin, tenê ew kesên zihniyeta wan wekî zehniyeta hikumeta Şamê ya veguhêz be, ew tê qebûlkirin û dikare xwe di nava her cihî de jî bigre, tenê bi yek rengî dixwazin. Ev yek jî gelê Sûriyê qebûl nake, gel ne gelê berê ye ku bitirse û dengê xwe neke, êdî li hemberî her bêmafî û zordariyê derdikevin, bi taybetî jî gelê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, heta em dikarin balbikşînin li ser konferansa Niştîmanî ya Sûriyê, ew konferans temsîla gelê Sûriyê nake, ji ber ku hemû pêkhate cihê xwe di nav de negirtin. Li vir hat diyar kirin ku hikumeta Şamê ya veguhêz tenê kesên wekî hişmendiya xwe dihewîne û wan di nava xwe de qebûldike. Di heman demê de heya roja îro rola jin di hundirê Sûriyê de wek rêveber nehatiye qebûlkirin. Wê demê bi van kiryar û nêzîkatiyan wê çawa karibe Sûriyake Demokratîk bide avakirin. Cihê ku jin lê tune be, ne gengaze ku kar û xebateke saxlem bimeşe.”

**‘Guhertina ku di Sûriyê de hat çêkirin, tenê ji navê Esed bû Colanî’**

Xalid Omer da zanîn ku tu guhertin li Sûriyê heya niha nehatiye çêkirin û wiha bê de çû: “Eger di Sûriya nû de hemû pêkhate û jin di nava xwe de nehewîne, wê rê li ber Sûriyeke demokratîk were girtin, bêguman heya niha hikumeta Şamê ya veguhêz ti guhrtinên erênî di nava xwe de nedaye avakirin. Ev jî wê bibe sedem ku temenê vê hikumetê kin be. Pêwîste guhertina Sûriyê ne tenê bi kesan be, lê belê pêwîste sîstem ji bingeh ve were guhrtin. Ji ber ku em di roja xwe ya îro de dibînin ku guhertinên hatin kirin, tenê ji navê Esed bû Colanî. Çareseriya Sûriyê ew e, ku ji dewleteke navendî bibe nenavendî û mafê her pêkhateyekê di nav de hebe û karibe tevahî gelê Sûriyê hembêz bike, da ku jiyaneka aştî û demokratîk di Sûriyê de were avakirin”.



## Gelo Tom Barrack li çi digere?

**Ahmet Aktaş**

Li goreyî fermiyetê, tê gotin Barrack, Balyozê/Şahbenderê DYEyê li Enqerê ye û nûnerê Trump ê Sûrî ye. Lê di meriyetê de, ji nûnertiya Trump û berjewendê DYEyê pirtir, weke nûnertiya R.Erdogan dike û ji bo berjewendê Tirkiyê dixebite!
Hîn li Balyozxaneya Enqereyê baş bi cih nebû bû, bi lez çû Şamê cem M.Colanî, Balyozxaneya DYE yê ji mêjve girtî bû vekir û mîna erkdarê du balyozxana kar dike. Li van deveran jî ranaweste, diçe Urdinê, Bexdayê û Hewlêrê, weke ku di nava van bajar û welatan de rîs dihûne! Ka, em werîn mijara xwe, ya yekser têkildarî doza gelê me ye! Heta nuha, ti gotinên xêrê ji bo doza me ji devê vî kesî derneketiye û ti kirinên wî yên erênî jî diyar nake, dişibe Jeffrey.
Berovajî, gotin û kirinên wî yên bêxêr gelek in; li dijî Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Rojava-Bakur Rojhilatî Sûriyê radibe, ev jî tê wateya dijberiya îradeya gelên me yê Rojava û vê herêmê. Bi neyartiya gelê Kurd tinê jî ranaweste, bi vê helwesta xwe ya nerînî û nebaş ya bêxêr, fesadî û fitneyê dixe navbera hemû pêkhateyan; gelan, eşîran û baweriyan; herî dawî hovîtiya li ser gelê Durzî li Siwêdayê nîşaneya vê yekê ye! Bi vêne jî ranaweste, pesindariya M.Colanî û R.Erdogan û hevalbendên wan jî dike.
Hema li pey van gotin û helwestên wî yên xerabkar, ji aliyê hêzên Colanî HTŞ û hevalbendên wî DAIŞ, EL NUSRAyî û hwd. çeteyên kujer û xwînrij ve, li ser gelên beravê yên Elewî, Xiristiyan û Durziyan êrîşên xedar pêkhatin, êrîşkarî bi tevayî ranewestiya ye, cih bi cih dewam dike. Belê, li dijî van êrîşên dijwar û xwînxwar ên hat ser van pêkhateyan, ji bilî çapemenî û reyadarên dewleta Tirk, di asta navneteweyî de nerazîbûnek berfireh derket holê.
Ji ber vê helwesta hêja û dorfireh, Barrak ê fotokopiyê Trump û James Jeffrey, gelek tengav bû, ji naçarî hema bi lez devê xwe guhezt û hinek gotin li dijî Colanî kir. Her wiha li goreyî agahiyan, hinek ji çapemeniya DYEyê dibêjin “Heke Colanî vê helwesta xwe ya xerab a dijî pêkhateyan sererast neke, wê di demek kurt de têkbiçe û ji hilweşandina Libyayê xerabtir were serê wî” !
Li aliyê din, divê helwesta çapemeniya hevalbendên Receb Erdogan jî neyê jibîr kirin, ji ber ku bi xurtî piştgiriya van êrîşên komkujî û nijadkujî kirin û her çend hinek kêm bûbe jî her dewam dikin. Li rex vê mijarê di çapemeniyê de, pesindariya Nêçîrvan Berzanî pir tê kirin û li gel vêya tê gotin ku di van rojên dawî de Barrack, hewcedarî Mezlûm Ebdî bûyî û li Urdinê hevdû dîtinin, lê Mezlûm daxwaza wî ya qirêj red kiriye. Her wiha tê gotin ku di nêz de li Parîsê, Macron jî li gel wan, carek din lihev rûdinên. Belê wisa diyar dibe ku Barrack, bivirê Trump li kevir da, siyaseta wan û hevalbendê wan Receb Erdogan û Hakan Fidan vê carê nemeşiya, derbeyek mezin xwarin. Colanî xwestiye, R.Erdogan biçe hewara wî! Berevajî wan, siyaset û helwesta Rêveberiya Xweser û HSD-Mezlûm Ebdî bi rûmetir û serkeftîtir bû û wê her serkeftî bin!



# ‘Avakirin û xebata Desteya Edaletê hêviya hemû civakê ye’

Parlementera Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (Partiya DEM) ya Erziromê û endama Desteya Edeletê ya parlementa Tirkiyê Meral Daniş Beştaş diyar kir ku merasîma îmhakirina çekan a koma Aştî û Civaka Demokratîk ne radestîbûn bû û wiha got: “Ev pêvajo, pêvajoya çareseriya sedê salan e.”

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Li gorî agahiyan, di civîna 18’ê Tîrmehê de gelek mijarên derbarê navê komîsyonê û avakirina wê bi rêya zagonan û bi tevlîbûna serokê parlamentoyê hat nîqaşkirin. Tê ragihandin ku eger biryarek li ser çawaniya avakirina komîsyonê were dayîn, dê amadekariyek nivîskî derbarê prensîb û rêgezên wê de were kirin. Piştî van civîn û amadekariyan, Kurtulmuş dê avakirina komîsyonê ji raya giştî re ragihîne.
Partiya Wekhevî û Demokrasiya Gelan (Partiya DEM) Hevberdevka Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK) û Parlamentera Erziromê Meral Danış Beştaş, Parlamenterê Antalyayê Saruhan Oluç û Parlamenterê Stenbolê Cengiz Çiçek wekî endamên desteya plankirî destnîşan kirine.
Di derheqê xebatên û pilansaziya desteya edeletê, Parlementera Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (Partiya DEM) ya Erziromê û endama desteya edeletê ya parlementa Tirkiyê Meral Daniş Beştaş ji rojnameya me re axivî.

**‘Pêvajoya Aşitî û Civaka Demokratîk gehiştiye qonaxeke gîring’**

Parlementera Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (Partiya DEM) ya Erziromê û endamê desteya edeletê ya parlementa Tirkiyê Meral Daniş Beştaş da xuyakirin ku pêvajo gehiştiye asteke girîng û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Weke tê zanîn piştî bangewaziya Rêber Apo ya 27’ê Sibatê ya “Banga Aşitî û Civaka Demokratîk” gavên pir giranbiha hatin avêtin. Rêber Apo bi riya dîmenê amadebûna dilgirtiyên Imraliyê bangeke ji bo pêşxistina pêvajoyê kir. Li gorî wê bangê gerîlayên Tevgera Azadiyê di 11’ê Tîrmeha 2025’an de li şikefta Casana ya girêdayî Silêmanîyê merasîmekê çekê xwe şewitandin. Yanî tê wê wateyê ku gerîla pêngavek dîrokî avêt. Li gorî wê bangê jî, di rojên pêşiya me de, hevdîtinên nû wê çêbibin. Piştî wan pêşketinan di nav civakê de gelek şîrove û nirxandin hatin kirin. Em jî weke DEM partiyê ji bo pêvajo baş bê fêmkirin civînên gel amade dikin. Rêjeyeke zêde ya gel piştgrî dide wê pêvajoyê. Pêwîste aliyê hikûmeta Tirk jî, hîn gavên berbiçav bên avêtin. Ji ber ezmûnên pêvajoyên berê gel zêde bibawerî nêzî desthiladariyê nabe. Lê baweriya xwe bi Rêber Apo tînin. Taybet piştî pêvajoya 2015’an de gelek bûyerên bi êş hatin jiyankirin. Gel bi hêviye, lê di heman demê de jî xwediyê tirseke mezin e.”

**‘ji bo derheqê azadiya Rêber Apo de gav bên avêtin, em ê xebatên xwe xurt bikin.’**

Meral bibîrxist ku tevî hewildanên Rêber Apo yên ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd, gavên ji bona azadiya fîzikî ya Rêber Apo ji aliyê hikûmeta Tirk ve nehatiye avêtin û wiha domand: “Xala yekemîn ya gîring li ser bê sekinandin şert û mercên Rêber Apo yên mafê heviyê ye. Ji ber ku yê ku pêvajoyê bigihêne serkeftinê Rêber Apo ye. Da ku Rêber Apo bikaribe vê pêvajoyê bi hemû cîhanê bide fêmkirin, pêwîst e bi raya giştî, dezgehên ragihandin û kesayetên girîng yên pêvajoyê re eleqedar be û bikaribe peywendiyan ava bike. Hîn hevdîtin li gel Rêber Apo berdewamin û Rêber Apo heya dawiyê hêza bêhempa tevî tecrîda mayinde jî kar û xebatê xwe berdewam dike. Pêwîst e demildest derfetên Rêber Apo bên sererastkirin. Em ê bi civînên desteya edeletê de jî, rewşa Rêber Apo bikin rojev. Rêber Apo peyama ku bi dîmen jî da, anî li ser ziman û got; “Azadiya min, azadiya civakê ye. Ger ku civak azad bû, wê demê ez jî azad im.” Tevî tecrîd û zextên giran jî Rêber Apo azadiya xwe ya kesayetî ti caran beriya berjewendiyên gel neda pêş û herdem azadiya gel da pêşiya azadiya xwe. Piştî pêvajo hat destpêkirin hin girtiyên siyasî ku cezayên wan xelasbûn e hatine berdan.”
Lê ev ne gaveke ku em bêjin pir girîng e, ji ber ku hîn zagon nehatine guhertin. Nêzîkatiya li hemberî girtiyên sîyasî û zext jî hîn berdewamin. Em ê ew desteya ku tê avakirin de, hemû rewşa girtiyan gotûbêj bikin. Em ê heya bigihin xalên serkeftinê em ê xwedî pêvajoya Rêber Apo daye destpêkirin derbikevin.”

**‘Pêwîst e di hindirê vê heftiyê de desteya edaletê bicive.’**

Meral Daniş ji bona avabûn û meşandina karên desteya edeletê ya ku ji bona pêvajoyê xalekê girînge got amadekarî xelas dora xebatê ye û wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Ji bona avakirina komisyona edeletê ya bingeha parlementê de bê avakirin de em gehiştin ber bi dawî yê. Em ji bona nûnertiya DEM Partiyê bikin 2 parlementerê din jî ez jî di nav de hatin hilbijartin; Parlementerê Antalya Saruhan Oluç û parlementerê Stenbolê Cengîz Çîçek. Tê payin ku demên pêşiyê de endamên desteya ku tê avakirin, yên nûnerê DEM Partiyê bên zêdekirin. Li gor nêzîkbûnên desthilatê ev deste tenê gerîlayên ku çekên xwe danîne we mijûl bib e, lê, li gor me pêwîste erkên wê desteyê berfirehtir bib e. Ew desteyê de, hemû partiyên siyasî yên parlementa Tirkiyê û partiyên ku komên wan di nav parlementê de nîne di nav xwe de dihewîn e. Nêzîkbûna neyînî ku partiya di nav parlementa Tirkiyê de cih digire ya b navê IYÎ Partî got em ti endama ji bona wê desteyê nadin xuyakirin. Lê partiyên din yên muxalefetê weke CHP û hwd. nêzîkbûnên erenî ji bona avakirina wê desteyê dan xuyakirin. Ew desteye bi rêveberiya serokê parlementoya Tirkiyê Numan Kurtuluş ve bê kirin. Ji bona zagona ku girtiyan berdin jî lihevkirinek heya niha nehatiye kirin û dê ew deste ji bona zagonê jî pêşniyarê xwe pêşkêş bik e. Hêvîya hemû civakê bi avakirina wê desteyê we girêdayi ye. Deshilat dibêje em ê rojên pêş li ser guhertina zagonê jî biryarekê derbixin. Du rojevên girîng yên wê desteyê hene yek; rewşa Rêber Apo û girtiyên sîyasî ya duyem jî: gerilayên ku çekên xwe şewitandin pêşî vekirina derfet û kirina sîyasetê ye. Ew gumanên derheqê jiyan û xebatê wan de pêwîste ji aliyê wê desteyê bê mîsogerkirin. Ger wisa bû ev pêvajoya bi pêşengiya Rêber Apo hat destpêkirin, dê bikeve qonaxa serkeftin ê.”





FENER



## HTŞ Xwestiye Piştî Siwêda Êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bike!

**Idrîs Henan**

Di şer û aloziya Sûriyê de têgîna “Hawarê” ya navê êl û eşîran lêbarkirî, weke pratîkeke çors a dîrokê berovajî dike, xwe daye der. Ji xwe dema ku ferdek an jî komek hewcedarê piştevaniyê bin banga “Hawarê” tê kirin ku li dijî êrişeke derveyî, kirîzeke darayî yan jî pevçûnek navbera du êl û eşîran de be, tê qêrîn. Lê dema di nava sîstema ku xwe weke dewlet dihesibîne de bangeke wisa ji aliyê rayedar û saziyên fermî ve li dijî pêkhateyek hundirê welat pêk were, pênaseya rasteqîn ya têgînê wenda dibe û li şûna “Hawarê” dibe provakasyon û handana etnîkî û mezhbî ku hevgirtina civakê û ewlehiya welat tûşî hilweşîn û jinavbirinê dike. Bi wê yekê re jî wateya xwe ya dîrokî weke gerdişekê ji dest dide û vediguhere amûreke desthilatdariyê ya tekûzkirina destpotiyê û nîşaneya meşa ber bi faşîzmê ve ye.
Desthilatdariya HTŞ xwestiye bi êrişa ser Siwêda re, vê têgînê derb bike û tabloya civakbûyîna ser bingeha hevtememakirinê ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye nîgarkirin, bê rûmet bike û lingekî esas ê civakbûyînê bişkîne. Li Beravê û Siwêdayê amadekariyên şerê fînalê ya li ser statuya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dihate kirin ku ancax bi reşkirin û berovajîkirina rastiyên dîrokî yên civakbûyîna bi hêz, karibin di plansaziyên xwe yên derûnî û madî de bi ser kevin! Xwestin bi wan êrişan re zextên siyasî û civakî li ser Rêveberiya Xweser û hêzên wê yên parastinê QSD girantir bikin û dergûşa wê ya civakî bitirsînin û ji nav bibin. Lê bi dilê wan nebû. Têgînên dîrokî ku di wateya exlaq û konevaniya gelên Rojhilata Navîn de ne, çendîn werin reşkirin û berovajîkirin, ji nû ve li ser koka xwe şîn dibin. Lew re; çiqas hewlên desthilatdariyê hebin ku bixin bin hukmê xwe û biçewsînin, lê di dawiyê de têgîn bi cewherê rastiya xwe re dibe yek û xwe ji bin hukmê desthilatdariyê rizgar dike. Daxuyanî û sekna pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê wê yekê isbat dikin.
Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li şûna parçekirinê, hevgirtin weke mekanîzmeya hebûnê hate hilbijartin. Li şûna wendabûnê, reaksyona êşîr û hewladên Bakur û Rojhilatê Sûriyê asta têgihaştina neteweyî ya eşîran isbat kir. Wê yekê jî destpotiya HTŞ ya xwe spartiye gefên faşîzma tirk ajot ku carek din li hesabên xwe vegere. Diyare nameyên xwestiye bişîne jî berûvajî lê vegerîne. Her wiha HTŞ nekariye bi vê kiryarê re, gerdişa dîrokî ku hebûn û prestîja eşîrtiyê diparêze, tundrewî û niyetên xwe veşêre, ne jî kariye belansa exlaqa eşîrtiyê têk bibe.
HTŞ herdu têgînên “Hawarî” û “lagirî û perestiya” eşîrî bi nav hev xistin. Yanê xwestiye “Hawariyê” ji pîvanên wê yên exlaqî bike û esaleta wê li ser bingeha zilm, zordarî û komkujiyan têk bibe. Li şûna ku biparêze, êriş dike û rastiyan berovajî dike. Bi awayê kîn, nefret, sorkirin û tûjkirinê bikar tîne ku berjewendiyên xwe yên desthilatdariyê mayînde bike.
Lê dîsa jî divê were zanîn ku HTŞ, tevî têkçûna li ser tixûbên Siwêdayê, dest ji ya xwe bernedaye û rûyê kirêt a lagirî û perestiya bi navê “Hawarê” bi awayên nûjen ên ku hemleyên reşkirinê fînanse dikin, guhertiye.
Bi kurt û kurmancî HTŞ dixwaze bi têgihaştina; kî rizgar dike hikum dike, li Sûriyê serwer be. Lê divê ew jî zanibe ku welat bi rêbazên terorê û derbkirina gerdişên civakî re ava nabin. Yê xwe bispêre hêza gelê xwe, ew bi ser dikeve.